

# MIZGÎN

15 - Cotmeh - 2025



# Naverok

- 1 Wênesazî
- 2 Wêjeya Zarokan
- 3 Lîsk
- 4 Welatê me
- 5 Tu dizanî
- 6 Tendirustî
- 7 Tîp û gotin
- 8 Navdar
- 9 Bexçeyê Navan
- 10 Jîngeh mala me ye
- 11 Jêhatiyên Zarokan
- 12 çîrok
- 16 Bixwînin û fêr bibin
- 17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê  
Amir Ferso

Dîzayn  
Mecid Alsadûn

Şêwekar  
Umer Ishaq  
Xalid Bîco  
Baran zagros  
Rojhilat

Sererastkirina Kurdî  
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî  
Abdulah Rehîl



Perperokê reng  
bike

لَوْنِ الْفَرَّاشَةِ فِي الرَّسْمِ  
الْمَرْفُوقِ.



## Buhara Ziman

A

Werin buhara ziman  
Rûnin bin siya tîpan  
Li dora xwe binêrin  
Tîpên rind û pir ciwan

Pênc ji van ew dirêj in  
Dirêj dengan dibêjin  
A û Ê û O, Î, Û  
Va roj hilat, tarî çû

U

Elfebeya tev zanîn  
Mozîk awazên şêrîn  
Berhem raman û danîn  
Mîr Celadet Bedirxan

Sêyên mayî ew kin in  
Kurtedeng wek şekir in  
E û I, U li gel wan  
Ez dil didim Kurdistan

O

Tîpên me sîh û yek in  
Tev nazik û çeleng in  
Awaz in çi xweşdeng in  
Lorandina dayikan

Bîst û sê tîpên dîtir  
Hîn navnas û hesantir  
Ew bi xwe yên dengdar in  
Bi dengî re heval in

D

I

Heşt ji wan ên dengdêr in  
Dengan li dor didêrin  
Zelal in mîna zêr in  
Dengbêj bi deng dihêrin

Be, Ce, Çe, De, Fe, Ge, He  
Şîva berxê me ceh e  
Je, ke, Le, Me, Ne, Pe, Qe  
Yê mêşa dixwe beq e

F

M

Re, Se, Şe, Te, Ve, We, Xe  
Bû dereng rabe ser xwe  
Ye tîpa ber dawî ye  
Ze zêra ser serî ye

Imran Yûsiv




Lîsk



Kulîlik hevala me ye

الزّهرة صديقتنا

اللعب



*Ew li Rojavayê Kurdistanê, li ser qeraxên şaxên Çemê Xabûr e. Îro ew der dişibihe girekî mezin ê axê, lê bajarekî kevnar di bin erdê de vedişêre!*

*Mîrov ji beriya zedetirî 4 hezar sal li Til Bêder jiyan e. Navê wê yê kevnar "Nabada" bû û çend şaristanî di wir e derbas bûne: Hûrî, Mitanî, Asûrî û Babîlî.*

*Mîrov li wir cotkarên jêhatî bûn. Wan genim û ceh diçandin û av bi kanalan ji çemê Xabûr dianîn.*

*Li Tell Bider, zanyaran zedetirî hezar û 200 tabloyên ji heriyê yên bi zimanê Akadî hatine nivîsandin, vedîtine. Li ser wan navên dextl û dan, mîrov û fermanên padîşahan hatine nivîsandin. Ev tablo dişibin "pirtûkên dibistanê", lê bi awayekî pir kevnartir.*

يقع في روج آفا كردستان، على ضفاف روافد نهر الخابور. المكان يبدو اليوم مثل تل كبير من التراب، لكنه يخفي مدينة قديمة تحت الأرض! عاش الناس في تل بيدر منذ أكثر من ٤٠٠٠ سنة. كان اسمه القديم "نابادا"، ومرت عليه عدة حضارات: الحوريون، والميتانيون، والآشوريون والبابليون. كان الناس هناك مزارعين بارعين. زرعوا القمح والشعير، و جلبوا الماء بقنوات من نهر الخابور. اكتشف العلماء في تل بيدر أكثر من ١٢٠٠ لوح طيني مكتوبات بالأكادية، فيها قوائم بأسماء الحبوب، والناس، وأوامر الملوك. هذه الألواح تشبه "دفاتر المدرسة" لكن بطريقة قديمة جداً.

## Til Bêder

## تل بيدر



## Zimanê daran!

Ma hûn dizanin hevalno, dar bi gotinan mîna me naaxivin, lê ew bi zimanê xwe bi hev re têkiliyan datînin. Di bin erdê de: Rehên daran bi toreke ji kuvarkên pir biçûk ve girêdayî ne û ev tor dihêle ku dar peyaman ji hev re bişînin.

Mînak: Ger kêzik êrîşî darekê bikin, reh bi rêya torê hişyariyekê ji darên din re dişîne da ku xwe ji bo xetereyê amade bikin. Di hewayê de: Hin dar dema ku rastî xetereyê tên bêhnên taybet derdixin, mîna ku bibêjin: "Hay ji xwe hebin! Kêzik tên!"

Herwiha zanyaran keşif kirine ku darên mezin, mîna "dayikê", xwarinê ji darikên biçûk re dişîne, dema ku darikên biçûk têra xwe tîrêjên rojê nagirin. Ev tê wateya ku dar mîna malbatekê li hev dinêrin!

## لغة الأشجار!

هل تعلمون يا أصدقاء، أن الأشجار لا تتحدث بالكلمات مثلنا، لكنها تتواصل مع بعضها بلغتها الخاصة؟ فتحت الأرض: جذور الأشجار متصلة بشبكة من الفطريات الصغيرة جدًا، وهذه الشبكة تسمح للأشجار أن ترسل "رسائل" لبعضها. مثال: إذا هاجمت الحشرات شجرة، ترسل الجذور إنذارًا عبر الشبكة للأشجار الأخرى كي تستعد للخطر. وفي الهواء: بعض الأشجار تطلق روائح خاصة؛ عندما تتعرض للخطر، وكأنها تقول: "احذروا! الحشرات قادمة!" والعلماء كذلك اكتشفوا أن الأشجار الكبيرة، مثل "الأم"، ترسل الغذاء للشجالات الصغيرة، عندما لا يصلها ما يكفي من الشمس. يعني الأشجار تهتم ببعضها، مثل العائلة!



*Hevalno, gelo we qet hingiv xwariye? Ew ne tenê xwarinek xweş e, ew diyariyek xwezayî ya ecêb e ku tiji sûd e. Kevçiyek biçûk ji hingiv bi lez enerjîyê dide laş û tê de madeyên xwezayî hene ku laş xurt dikin û li dijî mîkroban şer dikin.*

*Heger dema hûn bi sermayê bikevin, ava germ bi hingiv re vexwin, hûn ê hîs bikin ku qirika we baş dibe. Hingiv xweş e, hûn dikarin wê li ser nan bixin, an jî li şûna şeker têxin nav şîr. Ji ber vê yekê, hevalno, li şûna ku hûn gelek şokolata an şîrîniyan bixwin, hingiv bixwin; hûn ê tevahiya rojê xwe wekî lehengekî efsûnî hîs bikin.*



أصدقائي، هل جربتم العسل من قبل؟ إنه ليس طعاماً لذيذاً فقط، بل هو هدية طبيعية رائعة مليئة بالفوائد. فملعقة صغيرة من العسل، تعطي الجسم نشاطاً سريعاً، وفيه مواد طبيعية تقوي الجسم، وتحارب الجراثيم، وإذا شربت ماءً دافئاً مع عسل عند الزكام، تشعر أن حلقك يشفي. وطعم العسل لذيذ، فيمكن وضعه على الخبز، أو إضافته إلى الحليب بدل السكر.

لذلك يا أصدقاء بدل أن تكثر من الشوكولا أو الحلوى، تناول العسل؛ وستشعر أنك بطل خارق طوال اليوم.

# Peyva windayî

Van peyvên li jêr di xişteyê de bibîne  
û xêzkekê li wan bide.


Deşt Berav Bax Gulîzar Rê Mêrg

Çêre Cî Lîzgeh Qad Zevî



L	î	z	g	e	h	ş
G	u	l	î	z	a	r
B	l	ç	ê	r	e	q
e	D	M	L	C	î	a
r	e	ê	R	ê	Ê	d
a	ş	r	Z	e	v	î
v	t	g	B	a	x	R

Peyva wenda navê kulîlkekê ye ku li Kurdistanê şîn dibe û li seranserê cîhanê tê nasîn.



## الرَّوَايَةُ رُونَاك مُرَاد

وُلِدَتِ الْكَاتِبَةُ رُونَاكُ سَنَةَ 1965 فِي قَرْيَةٍ جَمِيلَةٍ، تُدْعَى تَلُّ شَعِيرِ الْقَرْيَةِ مِنْ بَلَدَةِ تَرْبِه سَبِي، وَقَدْ سَمَّاهَا الشَّاعِرُ الْكُرْدِيُّ الْمَعْرُوفُ "جَكْرخَوِين" بِهَذَا الْإِسْمِ الْجَمِيلِ "رُونَاكُ". وَلَكِنْ فِي ذَلِكَ الْوَقْتِ؛ لَمْ يُسْمَحِ النُّظَامُ السُّورِي بِتَسْجِيلِ اسْمِهَا رُونَاكُ، فَأَعْطَوْهَا اسْمًا آخَرَ لَمْ تُحِبَّهُ يَوْمًا، وَعِنْدَمَا دَخَلَتْ الصَّفَّ السَّابِعَ، اسْتَطَاعَتْ أَنْ تُعِيدَ اسْمَهَا الْحَقِيقِي، الَّذِي أَحَبَّهُ مِنْذُ طِفُولَتِهَا: رُونَاكُ.

دَرَسَتْ فِي قَرْيَتِهَا، ثُمَّ تَابَعَتْ تَعْلِيمَهَا فِي مَدِينَةِ تَرْبِه سَبِي. وَبَعْدَهَا التَّحَقُّقُ بِجَامِعَةِ دِمَشْقِ، كَلِيَّةِ الرِّيَاضِيَّاتِ وَالْفِيزِيَاءِ وَالْكَيمِيَاءِ. لَكِنَّا فِي السَّنَةِ الْدَّرَاسِيَّةِ الثَّلَاثَةِ، لَمْ تَكْمَلْ دَرَاْسَتَهَا الْجَامِعِيَّةَ، وَالتَّحَقُّقُ بِالثُّورَةِ، لِأَنَّ قَلْبَهَا مَعْلَقًا بِشَعْبِهَا الْكُرْدِي، الَّذِي يَنَاضِلُ مِنْ أَجْلِ الْحُرِّيَّةِ.

فِي الْأَعْوَامِ 1991 - 1992 تَابَعَتْ تَدْرِيْبَاتِهَا فِي أَكَادِمِيَّةِ "مَعْصُوم قُورْقَمَاز"، وَبَعْدَهَا التَّحَقُّقُ بِقَوَاتِ الْكْرِيلَا. وَهَنَّاكَ بَدَأَتْ تَكْتُبُ فِي دَفَاتِرِهَا عَنِ النُّضَالِ وَالْمَقَاوِمَةِ فِي جِبَالِ كُرْدِسْتَانِ، وَعَنْ سَيْرِ الشُّهَدَاءِ، الَّذِينَ ضَحُّوا بِحَيَاتِهِمْ.

وَفِي سَنَةِ 1999 أُصْدِرَتْ مَجَلَّةُ صَوْتِ الْحَيَاةِ فِي رُوحِ آفَا، ثُمَّ نُشِرَتْ فِي بَغدَادَ مَجَلَّةٌ أُخْرَى، مُخَصَّصَةٌ لِلْمَرْأَةِ، اسْمُهَا أَمَارَكِي (2004 - 2003) .Amarci

وَفِي كِتَابَةِ الرَّوَايَةِ، بَدَأَتْ بِرَوَايَةِ شَيْلَانَا، ثُمَّ تَلَّتْهَا بِرَوَايَةِ حَفِيدَةِ عَشْتَارَ، وَاسْتَمَرَّتْ هَكَذَا حَتَّى كَتَبَتْ إِحْدَى عَشْرَةَ رَوَايَةً عَنِ الثُّورَةِ وَالشُّهَدَاءِ، وَتَوَاصَلَ كِتَابَتُهَا الرَّوَايَةَ بِقِصَّةِ حَيَاةِ الشُّهِيدِ خُبَاتِ بُوَطَانِ.

هِيَ كَاتِبَةٌ مُنَاضِلَةٌ، لَمْ تَفْصَلْ بَيْنَ الْقَلَمِ وَالْبُنْدُقِيَّةِ، وَبَيْنَ الْخَلْمِ وَالنُّضَالِ. يَأْمَلُ مِنْهَا أَصْدِقَاءُ مُزَكِّينَ، أَنْ تَوَاصَلَ عَطَاءَهَا؛ لِتَبْقَى قُدْوَةٌ لَهُمْ فِي حُبِّ الْحُرِّيَّةِ وَالْإِصْرَارِ عَلَى تَحْقِيقِهَا.

Nivîskara Kurd Ronak di sala 1965'an de li gundekî xweşik ê bi navê Tel Şeîr, nêzîkî bajarokê Tirbespiyê ji dayik bûye. Helbestvanê Kurd ê navdar Cegerxwîn, navê wê yê xweşik "Ronak" lê kiriye.

Lê wê demê, rejîma Sûriyê rê neda wê ku navê xwe wekî Ronak tomar bike, ji ber vê yekê navekî din lê kirin ku wê qet jê hez nedikir. Dema ku ew ket refa heftemîn, wê karîbû navê xwe yê rastîn ku ji zarokatiya xwe ve jê hez dikir, vegeirîne: Ronak. Wê li gundê xwe xwend, paşê xwendina xwe li bajarê Tirbespiyê domand. Piştî wê li Zanîngeha Şamê, Fakulteya Matematîk, Fîzîk û Kîmyayê qeyd kir. Lê belê, di sala sêyemîn a xwendinê de, wê xwendina xwe ya zanîngehê tamam nekir û tevî şoreşê bû, ji ber ku dilê wê bi gelê wê yê Kurd ku ji bo azadiyê têdikoşiya, girêdayî bû.

Di salên 1991 - 1992'an de, wê perwerdehiya xwe li Akademiya Masûm Korkmaz domand, piştî wê tevî rêfên Gerêlayên Azadiyê bû. Li wir, wê dest bi nivîsandina li ser têkoşîna li çiyayên Kurdistanê û berxwedana şehîdên ku canê xwe feda kirin e, kir. Di sala 1999'an de wê Kovara Dengê Jiyana li Rojava weşand û piştî wê di sala 2003-2004'an de li Bexdayê kovareke din a ji bo jinan bi navê 'Amarci' weşand.

Di nivîsandina romanên de, wê bi romana "Şîlana" dest pê kir û piştî "Neviya Îştare" jî berdewam kir heta ku 11 romanên li ser şoreş û şehîdan nivîsand. Ew romannivîsa xwe bi çîroka jiyana şehîd Xebat Botan didomîne.

Ew nivîskareke têkoşer e ku qet pê nûsa xwe ji tîfinga xwe û xewnên xwe ji têkoşîna xwe veneqetandiye. Hevalên Mizgîn hevî dîkin ku ew berdewam bike, da ku ji bo wan di evîna azadiyê û biryardariyê de bimîne nemûn e.

**Hin Navên**  
**bi tîpa -S**

**Sulav**

**Sorxîn**

**Siyabend**

**Serhildan**

**Siyajîn**

**sêal**

**Sozdar**

**Serhed**

**Semyan**

## Dar ji pirtûkan hez dikin



Hûn dizanin hevalno, pirtûkên ku hûn jê hez dikin û dixwînin ji daran tê? Destpêkê depên daran tên hûrkirin û dibe hevîr, paşê kaxez jê tê çêkirin. Pişî wê peyv û wêne li ser tên çapkirin û dibin pirtûkên amade ji bo xwendinê! Dar kêfxweş dibin dema ku em pirtûkan dixwînin û diparêzin, ji ber ku ev yek dihêle ku em ji xwezayê hez bikin û guh bidin çandina daran. Û li Pêşangeha Herekûl a Pirtûkan, em ê bi sedan pirtûkên li ser jîngehê yên xweşik bibînin. Her yek ji wan parastina daran fine bîra me:

Her ku em karibin em darke nû biçînin. Li şûna ku em pirtûkan bavêjin, em wan bi hevalên xwe re barve bikin. Ji bo parastina daristanan em kaxizên ji nû ve çêkirî bikar bînin. Bi vî awayî pirtûk dibe hevala darê û xwendevanên ciwan jî dibin hevalên xwezayê.

## الأشجارُ تحبُّ الكتبَ

هل تعلمون يا أصدقاء، أن الكتب، التي نحبها، ونقرأها تأتي من الأشجار؟ بدايةً يُطحنُ خشبُ الأشجار، ويُحوَّل إلى عجينة، ثم يُصنَع منها الورق، ثم تُطبَعُ الكلماتُ والرُّسوماتُ؛ لتصبحَ كتبًا جاهزةً للقراءة!

والأشجارُ تفرحُ إذا قرأنا وحافظنا على كتبنا، لأنَّ ذلك يجعلنا أكثر حبًا للطبيعة، وأكثر اهتمامًا بزراعتها. وفي معرض هركول للكتاب، سنرى مئات الكتب البيئية الجميلة. فكلُّ كتابٍ منها يدكِّرنا أن نحمي الأشجار:

نزرعُ شجرةً جديدةً كلما استطعنا.

نشاركُ كتبنا مع الأصدقاء بدلًا من رميها.

نستخدمُ الورق المُعاد تدويره لحماية الغابات.

وهكذا يصبحُ الكتابُ صديقًا للشجرة، ويصبحُ القارئُ الصَّغيرُ صديقًا للطبيعة.

Hevalê min, karakterekî ji fîlmên animation yên zarokan hilbijêre ku tu dixwazî tevahiya rojê teqlîda wî/wê bike. Û çima tu jê hez dike?

يا صديقي، اختر شخصية كرتونية، تحب أن تقلدها يوماً كاملاً؟ وما سبب إعجابك بها؟

## Îman Hisên Elî - Heft salî

إيمان حسين علي - سبع سنوات

*Ger ez ji bo rojekê karakterekî filimê animation bûma, min ê şahyar Elîsa, Şahîbaniya Berfê, hilbijarta. Ji ber ku ew li her derê berfê çêdike û ez pir ji berfê hez dikim û dixwazim tevahiya rojê pê bilizim.*

لو كنتُ شخصيةً كرتونيةً ليومٍ واحدٍ، فسأختار أن أكونَ الأميرة إليسا ملكة الثلج. لأنها تصنع الثلج أينما ذهبَتْ، وأنا أحبُّ الثلج كثيراً، وأتمنى أن أعب به طوال اليوم.



## Sîpan Cemîl Dawûd- - 12 salî

سپيان جميل داوود - 12 سئه

*Ezê karekera Şefîq ji animationê Sponc Bob hilbijêrim. Ji biçûkaniya xwe ve ez jê hezdikim, ew komîk e û xwedî taybetmendiyêke ku naşbihe tu kesî.*


أما أنا فسأختار أن أكونَ شفيق من شخصيات سبونج بوب.

لأنني معجبٌ بشخصيته، منذُ كنتُ صغيراً، ولأنه مُضحكٌ، ومميزٌ بطريقةٍ، لا تُشبهُ أحداً.



## Çîroka : Rêwîtiya kaxeza efsûnî

(ورقة صغيرة في دفتر مدرسي تحكي للتلاميذ قصتها: كيف بدأت كشجرة، ثم كيف تحولت إلى ورق، ثم كيف أصبحت جزءاً من دفتر وكتاب، مع مواقف كوميدية بين التلاميذ الذين يحاورها)



12

Dema ez mezin bûm, tenê darên mezin hatin qutkirin.



Xeman nekin...li şûna wê darên nû tèn çandin!




Qurm li ser  
perçeyên biçûk  
tên qutkirin.

Wekî kartolên  
pijandî.



Paşê tê perçiqandin  
û bi avê tê  
tevlîhevkerin heta ku  
bibe wekî hevîrekî  
spî.



Mmm! Wekî  
hevîrê kulîçeyan!

Lê nayê  
xwarin.

Hevîr tê  
rakişandin da  
ku dûz û tenik  
bibe


Tam wekî  
kadişkên gezeran



Hevîr tê  
rakişandin da  
ku dûz û tenik  
bibe

Tam wekî  
kadişkên gezeran

Paşê tê zuhakirin  
û ûtkirin da ku  
şiyatok bibe.



Paşê tê qutkirin li ser pelên wek hev.

Qutbikin! Qutbikin hahahahah.



Kaxez bi hev re tèn komkirin da ku bibin lènûsk.

Lênûska ku ez erkê xwe li ser xêz bikim.

Û ez dil û kulêlikan li ser xêz bikim.



Çîrokên li ser leheng û serpêhatiyan.

Yan li ser firîn û azadiyê

Carnan em kaxez kom dibin da ku bibin pirtûkek dagirtî çêrok.






Û wiha ez ghiştîm we... Ji darê heta pirtûkxaniya we.


**Rêwêtiyeke pîr balkêş bû.**



Lê ji bir nekin...Kaxezan navêjin, ew buha ne.



Bi hezkirin min bikar bînin, pirtûk hevalên we ne.



E ger ez li ser kaxezê peyva (moz) binivîsim..Wê moz derkeve?

**Tev bi hev re dîkenin: Hahahahaha**





Pirtûkxane

مَكْتَبَةٌ

Library



Pirtûk

كِتَابٌ


Book



Lênûs

دَفْتَرٌ

Notebook



Pênûs

قَلَمٌ

Pen

# Çavika Mizgîn

## عدسة مزكين



# مركز

15 - تشرين الأول - 2025

